



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Newroz



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Hejmar (98) sal 17 Hizêran 2011 z - 2623 k Buha (15) ps

Gelo Sûriya avis e ?

Eve bêtirî çar heyvane, ku hundirê Sûriyê dikele û her diçe germtir dibe , ne ji ber ku xwepêşandanên gelêrî û aştîyane li gelek bajar û herêman berdewam in û hew , lê belê ji ber ku bersivdana karbidestan ji van xwepêşandan re, bersiveke nemirovane, sergermî û xwînî ye , bi girtinên ketûber , kuştin , û rûdawên leşkerî bi hemwelatîyên xwe re didin û distînin .

Ta niha , li gor jêderan , dora 1500 kuştî , bi hezaran birîndar , bêtirî 10000 girtî , û dora 15000 ên ku malên xwe li şûna xwe hêştine û berê xwe dane Turkiyê , Urdin û Libnanê , bûne koçber û penaber .

Bajarên Hema , Homis , Dêrazorê û ji berî wê bajar û derdora Derayê û derdora Şamê , ta tu bigihê herêmên parêzgeha Idlibê – sînorê Turkiyê(Hatayê – Iskenderon) – têra xwe xelk hatiye civilandin , mal wêran bûne , birînên kûr û xedar vebûn e , dijatî peyda bûye û her weha pirs aştîya civakê kêm zêde têkçûye .

Bajarên dî yên mezin mîna Heleb , navenda Şam , Reqê , Heseke û Siwêdayê digel Tertus û herêmên dî , ne di tevger û rewşeke germ û balkêş mîna herêmên dî de ne. Lê , li dawiya dawî rewşa civaka Sûriyê serûber rewşeke zor taybet û awarte ye , û ku weha bidome baş ne xuya ye D.R (11)



Pîreka jîr û zana

4

Nûşîn Bêcirmanî

Namak ji Newrozê re

6

Riza Çolpanê Dêrsimî

Ezmunek dîrokî li pêş me ye

8

Birasozê Sirûc

Jinik û Şêr

9

Ahîn Zozanî

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

Nûçe û Çalakî

Koçbarkirina kesayetiya welatparêz Hecî Mihemedê Meşayix

Êvara şemîya 28/5/2011an, Hecî Mihemedê Meşayix koça xwe ya dawîn ji nav me bar kir û çû ber dilovaniya Xwedê. Buhîştî di sala 1924an de li gundê Girşêran, herêma Tirbesipiyê ji dayik bûye û temenê xwe di nava gel de buhurandiye û bûye hevparê derd, êş û xemên wî.


Di rojên pêşî ji damezrandina Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê de, rehmêtî derbasî rêxistinê bûye. Berî damezrandinê jî, wî di gelek komcivînê **rêxistina yekemîn de, li** herêma Tirbesipiyê beşdar



bûye. Rehmêtî di gihandina alîkariyê bo şoreşa Kurdistanê Îraqê de, xwedî rolek xuya û berz bû. Herweha wî bi xwe radyoya Kurdistanê ji Helebê gihandiye Tirbesipiyê û ji wir jî derbasî Kurdistanê Îraqê kiriye. Gorbuhuşt yek ji endamên şanda Kurdî ya ku çûbû Kurdistanê Îraqê piştî vegera nemir Mele Mustefa Barzanî ji Yekîtiya Sovyêt.

Rehmêtî roleke civakî erênî di nav gelê xwe de, li herêma Tirbesipiyê bi hemî reng û beşên xwe ve leyistiye, û rewşa tevgera kurdî û ya Kurdistanê ta rojên xwe yê dawî şopandiye.

Bi navê komîta rêvebir a kovara Newrozê, em sersaxiyê ji malbata wî re dixwazin û em bi hêvî ne, ku cihê wî buhîştê rengîn be.



Nûçe û Çalakî

Zarokê ku cîhana bijîşkiyê matmayî kirî vedigere mala xwe

Li Ingiltere, zarokê ku hemû organên wî ê hundir li cihê şaş bûn û li dora 40 xuleyan dilê wî rawestiyayî- yê du salî- vedigere mala xwe. Berî niha jî, Avêsta Kurd li ser vî zarokî nûçe belav kiribû. Dayîka bi navê Nataliye Boughey a 22 salî li Tebaxa sala 2009'ê zarokekî tîne dinyayê. Rojekê Nataliye ferq dîke ku henese sitandinê zehmetiyan dikêşîne. Piştî kurê xwe nîşanî Doktoran dîke, ji nû dizane ku hemû organên wî li cihê şaş in. Dayîk bi vî xeberê şaş dibe. Doktoran gotin 50 ji sedî dibe ku bijî. Bi dehên emaliyatan ji Kian re çêkirin. 2 cara dilê Kian rawestiyê. Heta Doktoran got ku Kian miriye û malbata Kian amadekariya veşartina wî kirin. Lê, piştî li dora 40 xuleyan dilê Kian rawestiyê ji nûve bi hewldana Doktoran dilê wî kete bizavê. Niha jî, tê gotin ,ku wê roja îne Kian ji nexweşxanê vegere mala xwe. Doktoran got ku wê Kian di nava 6 heyvan de vegere jiyana xwe a asayî

Sûriyê ji zarokan ditirse !?

Enehîte : Morad

Di sala -1954- an û di bin biryara -836-an de , encûmana gelemper ya navnetewî li encama şer ,ceng ,talan ,terorî ,dijîtî ,meşexite, penabereî û h.w.d, rojeke cîhanî û taybet ji bo parastina mafên zarokên cîhanê bê cudahî ava bibe pêwîst didît.

Çi û çiqas zarok temen didin û dibine qurban ?!. Vêca jî, encûmana gelemper ya navnetewî roja -20-ê çiriya paşin sala -1959-an tabl(lîste-fitik)a mafên zarokan bi pir xal û mercên balkêş weke rojeke dîrokî raguhand . Da ku zarok di heyameke demiquras û tundirst de perwerde û mezin bibin , encûmana navnetewî pêşinyar dikir ku , girînge her dewletek li gor merc û dîtînen xwe rojeke bêlikirî binirxînin û li mafên zarokên xwe xwedî derkevin !.

Her wisan jî, dewletên şaristan û demiquras ji zû ve li mafên zarokên xwe xwedî derketine û nirxên wan bê cudahî bilind û bilin hildane ber ve jor!?. Ma gelo kes dizane ku Sûriya me jî, di -5-ê -6-an-1993-an de peymanî mafên zarokan pejirand û bi şahinazî îmza xwe xistiye binê fitika mafên zarokan ! Bi vê awî li pêş raya cîhanê kirasê demiqurasî lixwekiriye ! Ma kî nizane ku va ye çil sal îne zarokên sûriyê di merc û hoyên zor dijiwar de li ber xwe didin !! Ew ji hemû mafên xwe bêpar in , hêmenî û hevpişvan di jiyana wan de nîne !.

Lew re jî, zarokên Sûriya me di heyamine xizanî ,cudahî ,terorî penaberî , tirsê û h.w.d de perwerde û mezin dibin !? Ev rijîma şoven û totalîst îro hemû mafên zarokên Sûriyê bin pê kiriye, tang û topên xwe dane

totalîst îro hemû mafên zarokên Sûriyê bin pê kiriye, tang û topên xwe dane sîngên bi çûk û nazdaran ,

gole û qûrşînên xwe bêsûc û guneh li wan dibarîne û dide çi reng kuştin !! ango rêzgirtina îmiza xwe nagire . Va ye bû bêirî çar-pênc heyv in rijîm har û dîn bûye, nikare li xwe vegere , vîn û hêviyên

hemwelatiyan bipejirîne û bêxwîn rêtin pîrgirêka xwe çareser bike . Li tersî wê, ew kîn û zikireşya xwe, li serê zarokên reben dibarîne ! Loman jî , ra roja nivîsandina vê kurte babetê, bêtirî -40-zarokî bûne qurbana ezeziya vê rijîma dûrî tîrêjên mirovane ! weke mînak û nimûne :

Ew zarokê nazdar û delal li ber dilê dê û bavê xwe ku îro bûye sanbola şoreşa ciwanên Sûriyê Hemze Elî Elxetîb birînen li ser laşê wî pakirewan , kîn û çi mirovetiya Sûriyê baş diyar û şirove dikir !! Çiqa heyif û mixabin ku di dema vê rijîmê piştî xwe daye dijimin û neyrên me û bêşerim û fedî berê xwe daye zarokên bêguneh û qûrşînên xwe bê erê û na li wan dibarîne û navê xwe di rûpelên dîroka gunehkar û rûreşan de dicespîne, wisan jî, çi baş diyar û xuya dibe ku, duhatiya vê welatî ji zarokên Sûriyê re ye , deng û qêrîna zarokên mîna Hemze Elî Xetîb wê mîna zengilan di guhê mirovên bi rûmet de herdem lêxe , ta ku zarokên Sûriya me di heyamên Azadî , Aştî , wekihevî û demiqurasî de mezin bibin



Pîreka jîr û zana

Amadekirina:Nûşîn
Bêcirmanî
ji kevnatora kurdî

Dibêjin şahê bajarekî digel keça xwe di nava bajêr de digerîn. Li gastînekê mêrekî perîşan, bêmirês û cilqirêj dît. Şahê pozbilind tif wî mêrî kiriye. Keçikê got: "Bavo çima te tif wî mêrî kir?" heye ku ew mirovekî desteng û perîşan e! Şah lê vegerand "Ma, çima çekên wî lewitî û gemarî ne?". Keçê bersiv da "heye ev mirov bê jin e şahê min". Şah bi dengê bilind pirsî, ma pîrek mêran dikin mêr?. Keçê bi dengê nazik lê vegerand, "Erê bavo, pîrek mêran dikin mêr". Şah engirî, û bi zirt ji keça xwe re got: "Min tu dayî vî mêrî bi jinî, de here here wî bike mêr, eger tu rast dibêjî. Keça xwe li wir danî û vejeriya qesra xwe. Keç hate mal, çekên xwe birin û durek jî kire bin zimanê xwe, ji mêrê xwe re got: Ka were heyran! Ez bûme jina te, kanî mala te? çiyê te heye?.. Berê xwe dane mala mêr û derbasî xanî bûn, keçikê şande pey melayekî, mehra wan li hev birî, li wan bû sibe, jina wî berê xwe da bazarê, dura xwe firot, bêreke ji mêrê xwe re kirî û vejeriya mal, jê re got ev bêr ji te re ye, da ku sibe tu herî kar, çênabe tu li mal bê kar bimînî, teralî nema ji tere dibe, tu bûyî xwedî mal û jin.

Li wan bû sibeh, jina wî ew ji xew şiyar kir, bêra wî xiste destê wî û berê wî da cihê karkeran. Mêrik çû li wir ma ta êvarî bê sûde vejeriya malê, jina wî jê pirsî: "Ka te çi ji mala xwe re aniye?". Mêrê wê bersiv dayê û got: "Bi Xwedê min tu tişt nanî, tu kar bi dest min neket". Roja din, dîsa wilo. Pîrekê got: "Wilo nabe, divê sibe tu bi karwan re herî Bexdayê. Jina wî ji serokê karwên xwest ku mêrê wê bi xwe re bibe. Serokê karwan jê re got: Emê 1500 perî bidinê. Jinikê got: Başê keko, sibe wê bi we re biçê. Jina wî bi lez vejeriya malê û ji

mêrê xwe re got: Sibe zû li cihê karwan be, da tu bi wan re herî.

Bi tîrêja beyanê re, berê xwe da cihê karwan, ewî dewar ajotin û bi rê ketin, ta ku li wan bû şev, li ber bîrekê danîn da ku dewarê xwe av bidin. Serokê karwan got: Yê ku peyabe hundurê bîrê û dewla me dagire, emê 1000 perî pêdin, lê divê hûn zanibin yê ku dikeve vê bîrê ew venagere!! mêrê Xatûnê ji xwe re got: Çima ez nakevime vê bîrê? Eger ez vejeriyam, wê 1000 pere bibe para min, û eger ez venegeriyam jî, ezê ji gotgota jina xwe bi carekê re xilas bibim!!, rabû wî ji serokê karwan re got: Ezbenî, ezê bikevim vê bîrê.

Rabûn, ew daxistin bîrê, dewlên wan dagirtin ta ku dewaran têr vexwar. Ji wan re got: Ka werîs ji min re berdîn, da hûn min derxin... Hê werîs negihaye dest, dît ku beremek di qeraxê bîrê de vebû, mirovekî bi hêz ew kişande wê beremê, li dora xwe nerî hay lo, va bexçekî mezine, hemî darên fêkî ne, di nîvê bexçe de goleke avê heye û di wê golê de beqeke reş weke teniyê û pîrekeke bedew li kevya wê golê rûniştiye, ew mirovê bi hêz jê pirsî: Kuro ev beqa reş xweşikê yan ev pîreka ha?! Mirov ji xwe re ramand: "Bi Xwedê ker jî zane ku ev pîrek ji vê beqê xweşiktir e, heme bi Xwedê weke dibînim ez nabêjim". mirov got: "Ev beq ji vê pîrekê bi gelekî xweşiktir e"!!! Ji nişka ve dît ku ew beq peqiya û bû keçeke nazik û bedew, û ew pîrek bû beqeke reş. Mirovê bi hêz got: "Te xwe xilas kir û te em jî ji vê sergêjiyê xilas kirin, ji ber ev pîrek jina min bû û eva ku bû beqa reş sîhir jê re çekir û kire weke beqeke reş û xwe kire şûna wê de, divabû yekî ku rewşa wan nizanibe bibêje ev beq ji vê pîrekê xweşiktir e, vêce tu çi bixwazî ezê bi te dim. Mirov li dora xwe

D.R (5)

nerî û got:" ez dibînim darê te hemî yê hinaran e, heme têra min hinar bide min, mala te ava be. zilam rabû derpiyê wî ji hinara dagirt û ew vegerande bîrê.

Deng ji ser bîrê dihat, bang li wan kir: ez mirov im, min ji bîrê derînin. Serokê karwan jê re got heme dewarê me avde emê 1000 perî bidine te, dewl jê re rêkirin, ewî jî dagirtin ta ku dewaran têr vexwar. werîsê vala jê re rêkirin, wî xwe pê girt, ew kişandin ta ku ji bîrê derket. Peryên xwe ji wan standin û ji wan pirsî berê we li kû ye?. Wan got: Emê herin filan derê. De naxwe van hinar û peran bidine jina min. Cihê mala xwe ji wan re da naskirin, xatir ji wan xwest û berê xwe da Bexdayê da bigihe karwanê xwe yê berê.

Serokê karwên pere û hinarên wî gihandin jina wî, kêfa wê gelekî hat, perê xwe hilandin. Lê bû êvar, ji xwere got de ka ez hinarekê ji xwe re bişkênim, dema hinar şikand dît gava libê wê hemî bûne dur û yaqût!! Ew matmayî ma, durên xwe hilanîn. Lê bû sibeh, rahişte sê liba û berê xwe da dikana zêrker, ew li ser masa wî danîn û jê re got: Buhayê van çiqas e?. Zêrker li wan nerî û got : "Xwîşkê, sê dikanên weke ya min buhayê wan dernaxîne, vêce eger tu bibêjî erê, ezê perên li ba xwe bidim te û yên din piştî sê rojên din. Wê bi"de başe keko" lê vegerand. Perên xwe standin û piştî sê rojan çû yên din jî anîn mal.

Roja dî berê xwe da hostakî, jê xwest ku avahiyeke weke ya şah jê re ava bike, hoste jê re got:" Eger tu 2 milyon pere bidî min ezê di salekê de xilas bikim". "Eger tu di 2 mehan de xilas bikî tê çiqas peran ji min bixwazî?" Wî got : Ev 4milyon pere jê re divên." Ew razî bû û got : Ezê 4 milyon bidim te û leza xwe bike."

Piştî 2 mehan avahiya zavayê Şah amade bû, Xatûnê ji xwe re dergevan û navmalî danîn. Piştî heftiyekê mêrê wê ji Bexdayê vejeriya û hate bajarê xwe û çû cihê xaniyê

xwe , ooo ev çî ye..??!! ka xaniyê min?!. Wî cînarekî xwe dît, jê pirsî : Qey ev ne mala min e? Belê cînar, piştî tu çûyî, pîreka te ev avahî di şûna xaniyê te de ava kir. cînarê wî bersiva wî da. Çû da ku derbasî xanî bibe, dergevan nehişt ew derbas bibe. Jê re got: Keko ev mala min e. Rabûn gazî pîrekê kirin, ku mirovekî bi vî rengî hatiye û dibêjê ev mala min e. Pîrekê ferman da "bila derbas bibe". Ew derbasî malê bû, silav li hev kirin, mêrik ji jina xwe pirsî : Ev çilo çêbûye?, Gelo ez di xew de me ?!..Wê got : Na, ev bi sê liban ji wan hinarên te çê bûye, û min yên dî hilandine". Jina wî berdewam kir, çekin nû ji mêrê xwe re kirin û bi vî rengî ew jî bû "efendî ". Ji hev re gotin: Emê Şah vexwendî ser xwarinekê bikin, lê divê ew me nasneke. Pîrekê çekên mêran li xwe kirin û li ser masê bi wan re rûnişt. Piştî ku Şah têr xwar, çû da ku destê xwe bişo, keça wî li pey çû, Şah jê pirsî win kî ne?! Em herdû birayên hev in, me kar kiriye ta ku me têr xwariye û em zengîn bûne, şah pûnîjî ...Keça wî jê pirsî: Çima tu diponijî Şahê min?.. Bi Xwdê keçeke min hebû, min da yekî perîşan, ez nizamim rewşa wê çî ye û çî pê hatiye?. Xwezî berî niha tu buhata vî bajarî, min ê keça xwe bida te!! Di cih de keça wî desmal ji ser serê xwe hilanî, bavê wê ew nas kir, keça xwe hembêz kir û jê pirsî : Ev çî ye keça min ? "Ev e ew mêrê ku te ez dabûmê, ka vêca pîrek mêran dikan mêr an na ?! ".Belê keça min rast e, pîreka jîr û zana mêran dike mêr, gotina te ya rast bû keça min û ez şaş bûm li min bibore..!



Nameyek ji NEWROZê re

Li Başûrê Cîhanê Dengê Tê

Riza Çolpanê Dêrsimî

Li Awistûralya, ji xwendevanên Newroz û hemû Kurdperwerên Başûrê biçûk re, silav û rêz23-5-2011

Roj baş birayên xoşewîst, ez çil û yek sal e ku li başûrê cîhanê, li ser erdê kîşwera Awistûralya, li bajarê Sydney dijîm. Îro mirovekî temen heftê û pênc (75) salî, kalekî rîsipî me. Ango, min piranîya jîyana xwe li ser erdê vê kîşwera kevin derbas kir, lê li pêş çend salê min ên jîyanê mane, ez wê nizanîm, tenê Xwedê dizane.

Xwendevanên delal, ez di sala 2001'î da hatim ser erdê we yê pîroz, ku em ji wê erdê ra "Kurdîstana Başûrê Biçûk" dibêjin, bûm mêvanê çend Kurdperwerên Kurdistan, kesên hêja. Li Helebê bûm mêvanê Terzî Kek Osman, ku ew bi xwe Kurdekî Kobaniyê ye. Li Şamê bûm mêvanê hozan Dilawerê Zengî, û li Qamişlokê jî bûm mêvanê berêz Bavê Dara, Kek Newaf. Li wir bûm nasê serokê hêja û gorbihîşt, -ku çendek berê çûye heqîya xwe- Kek Îsmailê Dilovan. Van camêran ji min ra gelek karguzarî kirin, bi destûra we ez dixwazim berî her tişt ji van birayên xwe ra "spas", ji bo Kek Îsmail jî "di nav nûr da raze, ciyê wî, ku heye bihişt be" bibêjim, dûra jî bi kurtî qal û behsa bîografîya xwe bikim, ku hûn vî birayê xwe bêtir nas bikin.

Belê, navê min Riza Çolpan e, lê li welêt, angû li Dêrsim, bi taybetî jî li herêma qeza Mêzgirê, li wa Moxindiyê û li herêma qeza Depê -ku îro ew der girêdayî Xarpitê ye- bernavka malbata me "**Mala Guran**" e. Gelşa vê bernavkê jî bi jan û êş e. Min di bîranînên xwe de ,dûr û dirêj qal û behsa

vê gelşê û vî navî kirîye. Bîranînên min bi du (2) zimanan çap bûne; Ango ,bi Kurdî û Tirkî. Çapa Kurdî li Stenbolê, di nav weşanên "VENG"ê, "Jan û Jîyan, Bîranîn û Serhatiyên min". Çapa bi zimanê Tirkî jî di nav weşanên "DOZÊ" da derket, bi navê "Coğrafyasını Arayan Irmak, Acı ve Yaşam". Wate bi zimanê Kurdî "Çem Li Erdnîgarîya Xwe Digere, Jan û Jîyan".

Ez di payîza sala 1936'an de, li gundê nav "KÛPIK" ji dayîk bûme, hatime cîhanê. Min di sala 1946'an de ,destpêkê xwendina Tirkî kir. Ango, di deh saliya xwe de, lê bi zora dewleta xwînxwar. Du cendirme, li tev serbexo, angû muxtarê gund hatin, ji bavê min re gotin :“ Divê tu vî lawê xwe bişînî dibistanê; Lê eger ku tu naxwazî, divê 150 panginot dirav ceza bidî “,ku 150 panginotên wê dem û wextê, bê derew qasî 150 hezar lîra yê Tirk ê vê demê bû, ku bavê min ê kesîb ewqas dirav di xewna xwe da nedidît. Kesîbê Xwedê bêgav û bê havil ma ez şandim dibistana dijmin. Min pênc sal xwend, lê nebûm xudan buruntî, angû dîplomê. Lê, min perwerda xwe ya xwendinê di dibistanan, zanîngeh, enstitu û akademîyan da nedidît. Di destpêkê de , ez bi xwe bûm mamosteyê xwe. Ji ber ku ez bengiyê xwendinê bûm û evîna dilê min xwendin bû. Ji ber vê yekê jî ez ji xwendinê dûrneketim. Çi pirtûk, çi rojname, çi kovar min dît, birçî mam, lê min kirî û xwend. Piştî zewacê bergehên min bêtir fereh bûn, ez di rûplê pirtûkan de bûm ,nasê jîyana civakî, erdnîgarîya cîhan, çar (4) pirtûkên asîmanî, bi gotinek dî semawî, ol û rêolan, bûm nasê dîrok, çand, awaz û zargotina gelê xwe; bûm nasê sazûmanên kevin, wek sazûmana Kevneyar, **D.R (7)**

Nokerî, ango Koletî, Feodal, Kapîtalîzm, Sosyalîzm, Komînîzm û jîyana civakî, ku ez bi xwe jî di nav de wek herkesî dijiyam û îro jî dijiim. Di sala 1965'î de ez ketim nav refê Sosyalîst û Sosyal Demoqratan. Di destpêkê de ez ketim nav tevgera karkeran, bûm endamê sendîqata kinc û kolan, ku bi Tirkî ji wê sendîqatê re "Teksitîl" dibêjin. Ez heya sala 1970 di nav sendîqatan û tevgera ciwanên çep de bi çalakî xebitîm, min kar kir, lê ez di wan roj û salan de pir tûj bûm, cîhan li pêş çavên min toz pembe bû. Şerê sar di nav du (2) sazûmanên cîhanê de her berdewam bû, ku em jî alîgirê sazûmana Sowyetan bûn. Di wan rojan de Moskova ji bo min Kabe bû. Ji ber vê yekê jî min birûskên dewleta Roma Reş dikişand ser xwe. Di nav dem û atmosferek weha de, hin hevalan gotin : "Çêtire tu ji welêt derkevî. Tu xortekî zimantûj û anarşîst î. Rojekê zû ji vî welatî derkeve, ku tu neyê kuştin". Ez di roja 19-1-1970 da ji Tirkîyê derketim, min berî da cemsera başûr, kişwera nav "Awistûralya" hatim li Sydney cîwar bûm, bi tenê serê xwe, dûra bi alîkariya dewletê, zarok û bermaliya min jî hatin. Ew roj, ev roj, ez li Awistûralya, li bajarê Sydney dijiim, kalekî heftê û pênc (75) salî me. Min di sala 1974'da "Komela Kedkarên Tirkîyê li Awistûralya" damezrand, di sala 1977'an da ez ji çepê Tirkan dîrketim, ketim nav civata Kurd, min Kurd rêzkirin, di 29-1-1979'da bi tev gelek Kurdên welatparêz "Komela Kurdên Awistûralya" damezrand, me serokatî jî da birayekî xwe yê Kobanî, Şahîn Bekir, û ez bi xwe jî bûm sekretêr. Di wan salan de, sedî nod û neh em Kurdên Bakûr bûn. Dûre, hin bûyer sadir bûn, nakokî û ezîtî ket nav komelê, ez ji komelê dîrketim. Min di bîranînên xwe de dîr û dirêj qal û behsa vê gelşê jî kirîye, naxwazim li ser vê gelş û babetê dîr û dirêj bisekinim û serê we xwendevan bêşînim.

Belê birayên delal, bi kurtî jîyana min wisa ye. Nivîskarîya min jî, di sala 1984'an de dest pê bûye, ku ez xwe nivîskar nahesibînim, tenê hestên xwe tînim ziman, li ser kaxiza sipî reş dikim. Bila xwendevan ji min re "Nivîskar" bibêjin, eger ku layiq im.

Xwîşk û birayên ezîz, ez li çar kişwerên cîhanê -Asiya, Ewrûpa, Amerîka û Awistûralya- geriyam e; bûme nasê gelek gelan, bûme hevalê gelek zanyar, û sîyasetmedar, nivîskar û rewşenbîran. Li ser çiyar, di konên şivanan de bûme mêvan, û şivan ji min re bûne mamoste. Nebêjin "Şivan nabin mamoste". Bawer bikin mirov ji şivanan jî gelek tiştan fêr dibe. Li gelek welatan, bûme mêvanê profîsor, sîyasetmedar, nivîskar û hunermendan, ew jî ji min re bûne mamoste. Min bi sedan pirtûk xwendine, hêj jî dixwînim û bi hezaran jî rojname û kovar. Heya roja îro 21 pirtûkên min çap bûne; ji van piranî helbest in, sê roman, ku min yek ji Kek Newaf ra bi destan şand, dudu jî bi e-mail jêre rêkir. Yek çîrokên gelî, yek jê berhevokû ya din dastanek evîniyê, wek ê Mem û Zîn, Sîyamend û Xecê. Niha jî di dest min de romanek heye, ez li ser wê dixebitim. Navê romanê "GURÊN DEVBIXWÎN" ku ev jî çîroka bapîrê min e; lê, çi wext ez vê berhema xwe diqedînim, nizanîm. Lewre tendurustiya min roj bi joj ber bi xirabiyê diçe, çale pêş nêzik bûye. Hêvî dikim berî ku bikevim wê çala kûr, vê karpêka xwe jî biqedînim.

Min serê we eşand bibexşînin. Ev nivîs tenê ji bo hevnasiya me ye. Lê, li rojên pêş, hêvî dikim ez car-caran ji rûpelên Newrozê re hin tiştan binivîsînim.

Carek dî silav û rêz ji we xwendevanên hêja re. Bimînin di xweşiyê de.

Riza Çolpan.

Navnîşan: 2-Laguna st, Kelly Ville Ridge, 2155, Sydney Australia

Têlêfon: 61-2- 9629 39 90.

E-mail: rizacolpan@gmail.com

Ezmunek dîrokî li pêş me ye

Birasozê Sirûcî

Di vê serdema herî teng ya jiyana tevgera Kurd de, bi qasî girêkên heyî , ewqas gerekî bi çêkirina mala Kurdî heye.

Lewre tevgera Kurd xwe beranberî ezmûnek dîrokî dibîne. Ew ezmûna jî , ji guhartina siyaseta navnetewî ya ku çêdibe û ya dê çêbibe di paşerojê de, xwe encam dide holê. Ewê xuya bike ta kû derê tevgera Kurd kanîbû xwe biçespîne wek tevgera Kurd, di nav hêzên rikber ên niştîmanî sûrî de. Di vê derfetê de , hin pirs xwe didin pêşberî mirov:

Gelo: Ma tevgera niştîmanî ya sûrî(rikber) jê baska Kurd di rewşek wiha de (perçebûn bi perçebûn) , dê kanibe bandorek erênî li rijîma Sûriyê bike?.

Gelo !. Ma wîkîliks, di vê pêvejoya telîz û bi taybetî li Rojhilata Navîn de , dê çi bi xwe re bîne û çi bibe . Bi hezaran belge dibin hev de mane.

Ma hibijartina perlemanê Êraqê û çêkirina wezaretan bi şeweyekî demiqras, bi tevî zextên heyî , çi têrorîst û çi bandora rijîmên derdora wê li hêz û berên wê , wek karanînek demiqrasî , dê çi rolê bilîze?.

Gelo!. Gemiya Rojhilata Navîn di paşerojê de, dê bi rêveberiya kê be?. Ger ortaxî be, dê para Kurda hebe.

Bi mijûlbûnek dirêj ji bo bersivdana van pirsan, nemaze ji bo Kurdên Sûriyê. Mirov tenê kane bêje Lêvegergeh ZOR ZOR PÊWÎST E . Mebest ji Lêvegergehê ne ev nava bi xwe e. Lê belê, girîngî ew e ku Tevgera Kurd bi yek deng û helwest be. Û nûnertiya rewa ji miletê me yê Kurd li sûriyê bête wergirtin. Bi pirograma xwe ya rêzanî li kêlek tevgera niştîmanî ya sûrî û li hember dîmena rêzanî ronî bide. Li hember welatê xwe rolek niştîmanî bilîze , da ku kanibe çareseriyek dadmend ji doza xwe ya Kurd re bike, û doza demoqrasiyê li

welatê xwe bibe serî.

Careke din, pirojeyeke weke Lêvegergeh bi pêdiviyê guftûgo, danûstandin û guhdarkirinê li ser raman, bîr û baweriyê ye. Da ku bi hev re teşeya programek rêzanî bipelgehînin . Amediya xwe ji vê heyama rêzanî ya guhartî re saz bikin . Ne ku bi ser hev de bidin girî û bêjin: 'Wax dê çawa bibe'. Helbet piştî bûyera rêzanî cihê xwe bigre, wê hîngê tevgera Kurd dê bibe bireserê pesnên Mala Çîçekê. Emê bi kurtî çîroka mala çîçekê bînin zimên: Yekî kurekî xwe yî bi tenê hebû. Bi qasî bi delalî xwedî kiribû, ew zû jî bi jin kir. Bûka jê re xwestî wek wî bi delalî xwedî bibû. Piştî çend rojan xezûr bi bûka xwe şadibe û dibêje: Salê tê, tuyê bibî diya zarokekî û navê wî ezê lêkim Delal. Bi qasî çûkiya xwe fedîkir û ber ve bîrê çû. Dît ku devê bîrê vekiriyê û mêweya çîçekekê nû dibişkife di qeraxa wê de hêşin hatiye. Seriyê xwe da ser çongên xwe û giriya...

Ji xezûr be ku ji ber gotina wî giriya (wek lax), got: Tu çima digriye keça min ?. Xezûr, xwesî û mêr di ser re rawestîn. Bûkê bi kelgirî got : Hûn vê mêweyê dibînin?. Ta sala tê wê mezin bibe û çîçekan bigre. Û Delalê min ku were çîçekan jêke , dê têkeve bîrê û bimire. A xezûr , xwesî û mêr jî didin girî bi ser de û kî ji malbata wan tê bê pirsîn , ew jî bi ser de dide girî... Wanî nav lê bûn MALA ÇÎÇEKÊ. Ta ku wek mala çîçekê li me nebe, berî her gaveke din divê kort û çehlên dor xwe kor bikin û bi erkên xwe yên netewî û niştîmanî rabin.

Herwiha her mirovekî Kurd dimîne tewanbarê tevleşbûna hêviyên miletê me yê Kurd û beravêtina armancên wî yên ji bo hilanîna mafên me yên netewî yên rewa, ta ku bête rawestî li hember dadwer (nifşên nû) di dadgehê de. Ev dadgeha gelêrî di biryara xwe de ya herî sert û dijwar e. **D. R. (11)**

Jinik û Şêr

Ahî Zozanî

Dibêjin jinek li gundekî hebû.


Ew jin herdem bi gilî û gazin û perîşan bû, radibû û rûdinişt digiriya, kê ji gundiyan wê didît jê re digot çima wisan tu herdem xemgîn û bi kul û derdî? .

Bi keser li wan vedigerand û digot: Ez bextreş im, min xêr ji jiyana xwe nedît!

Rojekê ji rojan, cîranek pêrgî wê hat li ber bîra avê û jê re got: Porkurê rewa di te de nemaye, tu mîna xezalekê bû, me digot wa gula Buharê ji wir hat, ka ew bejin û bala te, çima tu roj bi roj mîna mûmê dadwerivî, ka ji min re bibêje çi bela te ye?

Jinikê bi dilekî şikestî û gewriya wê tije girî - di ber xwe de diponije -lê vegerand:

Ma wê çi bela min be cîranê!



Wey te serê min xwarê, ma min jî mîna bûkan xêr ji mêrê xwe dîtiye, şev û roj xircir e, herdem şerê me ye, diyar e ku ew ji min hez nake!

Dema wê wisan got, cîranê jê re got dermanê te li bal şêx e!

Wê hingê jinikê wek ku jê bawer nekir, hema bilez xwe avêt kirasê wê û jê re got: Ez di bextê te de, ka riya şêx nîşanî min bide!

Cîrana wê jê re got wê şêx devgirêdanekê ji mêrê te re çêke, wê bihêle mêrê te bibe mîna hunguliskekê di tiliyên te de.

nema Jinikê da dû cîrana xwe, dibêje ez di bextê te de ka navê şêx bide min?

Cîrana wê got ji xwe re bipirse ji hinan tê bi ser riya wî vebî!

Vêca jinik dibe wek miriyê ku nuh serê wî li kêvir dikeve, li xwe hay hat û bû bi xwe re diaxive, dibêje gerek ez jî li bextê xwe bipirsim, divê zû xwe bighînim vî şêxî, çûna bal şêx jê re dibe derdek, dizane razê. Radibe derdikeve, ji malê diçe ,ji gundiyan

dipirse kî mala şêx nas dike?

Xelk nizanin çi mesela wê ye, yek ji gundiyan jê re dibêje xanim mala şêx, li filan gundî ye! Jinik jî bi kêf jê re dibêje spas lawo de here Xwedê miradê te bi cih bîne.

Jinik diçe mala şêx, dema derbas dibe, xwe davêje dawa şêx û digrî, jê re dibêje şêxê min ez di bextê te û ûcaxên te de bim, tê bihêle mêrê min ji min hez bike!

Rebenê şêx istexfariya xwe tîne, çiqasî jê re dibêje ez nikarim keça min here Xwedê we bi hev şêrîn bike, jinik hey digrî û doza devgirêdanekê dike da ku mêrê wê jê hez bike.

Ew nizane ku ev şêx ji Xwedê ditirse û baweriya wî bi van hawa nayê!

Lê şêx xelasa xwe ji destên jinikê nabîne, ew jî şêxekî pir belengaz e.

Ji bo ku wê ji ser riwê xwe bide alî, jê re dibêje keça min îşê te pir zahmet e gereke tu porekî ji şêrekî ji min re bînî ta ku ez karibin miradê te bi cih bînin!

Jinik ji kêfa direve derve di hayê wê de wisan hêsan e porê şêr bi dest bixîne.

Dema diçe derve şêx derî digre dibêje here Xwedê riya rast bide ber te.

Jinik bi rê de li xwe hay hat, heylo ka wê ji kû porê şêr peyda bike û kî diwêre nêzîkî şêr bibe. Dîsan riwê jinikê zer dibe, xemgîn dibeû dest bi girî dike.

Pîrejinek ji wî alî de bal wê de tê, dilê wê xweş dike wê haş dike, jê dipirse: Keçikê çi bela te ye?

Ew jî derdê xwe jê re dirêse û çîroka xwe bi dawî kir û got pêdiviya wê bi porekî ji porên şêr heye û nizane wê çawa peyda bike.

Pîrê jê re got keça min rabe negrî, li wê daristanê şêrek heye, here ji xwe re porekî bîne.

Jinik dibêje şêr wê min bixwe, ez newêrim!

Pîr jê re dibêje gêjê here, lê nêzîkî wî nebe, her roj jê re hêteke bêrx bibe **D.R(10)**

Dumahîk: Jinik û

bavêje ber wî, wê were û ji destê te bixwe, tê karibî nêzîkî wî bibî.

Jinikê gotina pîrê xist serê xwe û berî da malê, berxek gurand û ji bo şêr amade kir.

Dema nîvroj bû, temûzê av di kûz de dikele, kes nikare serê xwe ji germa rokê derxîne.

Jinik dikeve kezeba rê de , berê xwe dide daristanê , û goşt dibe ji şêr re wek ko pîrê jê re gotiye. Çend roj bihurîn, şêr nêzîk bû, bi çavên aramî li jinikê dinerî û goştê xwe dixwar û li tenişt wê mexel hat, zik têr e dunya germ e, şêr ket xeweke giran, jinikê jî destê xwe di ser wî re dibe, wî dilorîne, hema bi dizî porekî ji porên şêr radike û bi lez xwe ji daristanê dişemitîne. Berê xwe dide mala şêx, ji kêfa lêvên wê naçin ser hev, dema dighê bal şêx dibêje şêxê min, va ye min porek şêr ji te re anî, de ka bihele mêrê min ji min hez bike!

Şêx jê dibêje, jina delal tu pir zîrekî; ka ji min re bibêje te çawa karîbû vî porî ji wî şêrê har bînî?

Jinikê çîroka xwe jê re veçirand.

Wê hingê şêx lê nerî û jê re got: Xanima ciwan, min ji te re got tu zîrekî gelo mêrê te ji wî şêrî hartir e ku tu nikarî xwe têkî kirasê wî?

Here riya dilê wî nas bike, û bizanîn birçîbûna wî têr bike.

29.04.2010

Îran di pileya sêyemîn a qaçaxa mirovan di cîhanê de ye

Zarokên ku di Îranê de tîr firotin pitir ji aliyê ajotvanan, melayên "Hewzeyên Êlmiye" û kedkarên Efxanî ve bi buhayekê pir kêr tîr kirîn. Herweha keç û kurên Efxanî ji Îranê bo welatên din bo destrêjiya cînsî tîrê qaçaxkirin. Li gor NGO'an, eva di demekê de ye ku Îran ne tenê tu hewlek bo çareseriya pîrsa han nedaye, belkî

bixwe rêxweşker e bo qaçaxa mirovan û heta hinek ji karbidestên rejîmê jî bi awayek çalak mijûlî vî karî ne. Hêjayî gotinê ye ku Îran di van 6 salên dawî de hertim di pileya sêyemîn a qaçaxa mirovan di cîhanê de bûye.

Wezaretê karê Derve a Amerîkayê rapora salane a xwe li dor qaçaxa mirovan weşand ku tîrê Îran di pileya sêyemîn a cîhanê de cih girîye. Li gorî çavkaniyan Îran welatek e ku bûye nuqteya destpêkê, cihê derbasbûn û meqseda mêr, jin û zarokên ku bo karê bi zorî û destdirêjiyên cînsî tîrê qaçaxkirin.

Li Amedê peykerê Cegerxwîn hat danîn Li Navenda Çanda Ciwanan a Cegerxwîn ya li Kayapınara Amedê busta Cegerxwîn hat danîn.

Di merasima vekirinê de peyama ku Şaredarê Kayapınarê, Zulkuf Karatekin ku ji sala 2009'an ve di girtîgehê de ye şandibû jî hat xwendin. Karatekin di peyama xwe de wisa got:

"Ez di wê baweriyê de me ku, berhemên ku xwendekarên me derxistine holê dê kedeke wan a çandî û civakî ji bo bajarê me hebe. Ji ber vê yekê hevalên me yên di Akademiya Cegerxwîn de dixebitin, dê keda wan pê çêbibe ku çanda me ya tîr asîmîlekirin bigirînin pêşerojê." Paşê Wekîlê Şaredar Mahmut Dag axivî û got ku di sala 2010'an de navenda wan a çandê vebûye û ji wê rojê de 2 hezar xwendekar beşdarî qursên cur bi cur bûne."

Piştî axaftinan, peykerê Cegerxwîn hate vekirin. **Diyarname**



Ev herdu nûçe ji Rojname Agirî H. 162 hatine girtin

Dumahîk : Wêneyek....

Ma gelo ev ne xwekustîn bi xwe ye!! Ma kanîn hişmend, rîsipî û zana, ma kanîn ewên ku di rojên weha de li hember şer û nezaniyê deng bilind dikirin?!!, ma qey ew di civaka mirovatiyê de nemane gelo?!!

Pêwiste mirov, hemû mirov, li seranserî cîhanê, bê derengî, li dij tund û tûjiyê, li dij şer, kuştin û berberiyê dest bidin hev û serî hildin, rijandina xwîna mirovan rawestînin û ji bo aştiyê xebatê bikin. Dewletên mezin, ji bo vê armanca pîroz dikarin roleke erênî bilîzin eger ew li hin berjewendiyên xwe negerin. Lê, mixabin ku îro ew dewlet ji bo peydakirina cihê lingên xwe di devereke nû de, ew bi xwe pêl xwîna mirovan dikin û mirovatiyê bi erzanî difiroşin!!.

Hêviya min ew e ku, paşeroja nêzîk li devera me û li cîhanê bi tevayî ronî û gul bide, destê kujer û bazirganên şer û kînê têkeve bend û kelemçeyan, ew cezayê xwe bibînin, mirov û mirovatî, jin û zarok maf dê cîgehên xwe yê rastî bigrin û nema zarok ji cendirman bitirsin û xwe ji ber dîtina wan bavêjin nava dojeh û agirani!!.

În 17.06.2011

Dumahîk : Ezmûnek

dadgeha dewletan û ne jî dadgeha navnetewî ye. Di yê dewletan û navnetewî de, parêzer ji û civakî di welêt de, li çareseriyek demiqras û dadmend ji doza Kurdî re bigerin dêvilî tewanbar berwîdide li pêş dadwer. Lê di dadgeha gelêrî de, ya ku nifşên nû dadwer in û dîrok li ser her gunehî şahid e, dimîne bê parêzer. Biryara dadgehê yan ji ser tewanbar hemî tewan têne xistin û bê guneh dibe, yan jî ta ebed dimîne gunehkarê mîlet. Li dawiyê ezê vê mijarê bi gotina amostê xwe nemir Ismaîl Umer, Bavê Şiyar, kuta bikim: "Hişmendî û berpirsariya nîştîmanî ew e ku tevahiya hêzên nîştîmanî yê di hundir destlatê de û yê dervayî wê û çalakiyên çandî."

Dumahîk : Gelo Sûriya...

berê wê li kû ye, û dê çi bi xwe re bîne !!

Lewre jî, partiyên siyasî, rewşenbîr, bîrewer û nifşên nû, di mijûlbûn û keftelefteke dîrokî de ne, helwest, propaganda û durîsmên bi pîvan û bê pîvan têne hildan ... Lê, para mezin ji xelkê Sûriyê bêdeng, çavdêr û xweragirtî ye, xwe najotiye û xwe nedaye nav çalakiyên rikebiriya Sûrî.

Di vê çerçewê de, hêjayî gotinê ye ku, rê li ber hêz û partiyên Sûrî yê rikber, baş ne xuya, ne li hev, ne jî xwedî navend û pirogrameke kifş û zelal e.

Ev yeka he jî dihêle ku karbidestiya rijîma Be, is a serdest ji ya xwe nemîne, her û her di tund û tûjiya xwe de, di kiryarên xwe yê hovane de berdewam be. Loma jî, di vê dema nazik de, ya herî pêwîst, ew e ku, tevgera rikebir – çi kurd çi Ereb – li hev be, da ku karibe giraniyeke bi rêk û pêk, pêk bîne û rê li ber guhartina demokratîk a aştiyane veke, û li pey serberdayetiya durîşman neşimite.

Dawiya dawî, çendî rewş tevlihev û aloz be, kul û êş giran bin, rewşa Sûriyê avise, pêşeroj jî ne ji sîstema rijîma tek partiyê re ye.

Sekretêrê Parta Yekîtiya demokrat a Kurd li Sûriyê .

Keçek kurd bi cilên**kurdî bû xweşika Hollywoodê**

Keça kurd Sureya Fellah roja îne li Universal City'yê di Hotêl Hiltonê de bi cilên kurdî beşdarî merasîma hîlbijardina şacuwanê bû û bû yekem. Li gorî ajansên nûçeyan di hîlbijardina şaciwan a 2011'an li Amerîkayê, jineke Kurd bi navê Sureya Fellah beşdarî kir û pileya yekem bi dest xist.

Sureya Fellah yek ji çalakvanên Mafê Mirovan û Mafê Jinê û har wiha parêzvanê Mafê grûpên etnikî û olî ye. Her wiha



ew rawêjkar û şewirmendê karûbarên mafê mirovan e û gelek ji hevpeyvîn û daxuyaniyên wê li ser rewşa girtiyên siyêsiyên Kurd û grûpên etnikî û olî

Dîmenek ji komkujiya Dêrsimê

Rêberê Silîvî

Diho, min gotareke balkêş sebarek komkujiya Dêrsimê ya sala 1937an xwend, di wê gotarê de, wêneyeke wisa hovane heye ku hestên mirov ji kokê ve dihejîne, rastiya berpîrs û qumandarên Tirk ên zikreş û şerxwaz tîne ber çavan.

Artêşa Tirk derbasî gundekî devera Dêrsimê dibe, bi gule û singoyan kê û çî dibîne dîkujê.

Agir berdide malan dişewitîne û mirina reş hawîr belav dîkê... Di

nava wê hawar, girîn û qîrînê de, efserekî Tirk zarokêkî Kurd î piçûk dibîne, çawa ku bi lez ew ji ber mirinê direve.. Dê, bav, xwişk û birayên reben hatine kuştin û rivîna agir ji mala wî li hev digere bilind dibe!! Efsêr bi zimanê Tirkî gazî wî dîkê jê re dibêje "raweste kuro, were vê derê, were cem min". Dema ew piçûk dengê wî bi zimanê tirkî dibihîze, li şûn xwe dizîvire, cendirmekî dibîne, hema yekser bazdide û bê dudilî xwe tavêje nav rivîna wî agirî, xwe dîkujê û xwe naspêre efsêrê Tirk!! Efsêr, ji vê dîdarê seyr û matmayî dimîne, ji xwe re dibêje: Evî piçûkê han dilovaniya agir ji ya me Tirkan çêtir dîtiye, ew ji ber me reviya û xwe avête nava wê



dojehê!!.

Mala me ne ava be, qey me çiqas tirs xistiye dilê vî gelê reben î perîşan, me çî kiryarên hovane derheqa wî kirine?!?. Radibe şeşberê ji ber xwe dikişîne û xwe dîkujê!!.

Evê wêneya dilşewat, ji aliyekî ez xemgîn kirime, ji aliyê din ve, rewşa kuştin û talankirina ku îro li gelek gund û bajarên welatê me Sûriyê dibe tîne ber çavan, çawa ku artêşa dewleta me Sûriyê bi tang û topên xwe derbasî gund û bajarên dibe, wan dorpêç dîkê, çalakvan û azadîxwazan yek bi yek digre dîkujê û hawîr terorê belav dîkê!! Ji ber van kiryarên hovane û kuştina bi sedan zarok, jin, pîr û kalan jî, bêtir ji 10 hizar welatî sînor derbas kirine, li Urdirnê, Libnan û Tirkîyê cîwar bûne.

Tê zanîn ku berê, dema du êl diketin hember hev û dixwestin şer û kuştinê bikin, tenê ku jinek biketa navbera wan, ji ber ku jin maka jiyanê ye, cîgehekî wê yî taybet di civakê de hebûye, yekser agirê şer dihate temirandin û herdu êl ji ber hevdu radibûn. Lê sed mixabin ku îro, gule li serê jinê bi xwe dîkeve û laşê wê li kastînan dimîne!!..Zarok, paşeroja gelan û mirovatîyê, ji kuştin û mirinê bê par nema ne!!..Tu çawa çavên xwe digerinî, tu kuştin, kuştin û xwîna sor a mirovan dibînî, ma gelo berê mirovatîyê bi kû ve ye? **D.R.(11)**

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de*